Cercûr Cemîl

GOTIN Û KIRIN JI HÊV DÛRIN

© Cercûr Cemîl

Rêzdar û Xwendevanên hêja,

berî ku ez werim li ser mijar û nîqasha ku, ez dixwazim bahsa wan li jêr bikim, di serî de ez Kongreya Federasiyona Komelên Êzîdiyan ya 9emîn, ku wê di 8. hêzîranê li sala 2014 de pêk were, li gelê kurd, civaka Êzîdî, malbatê shehîdan, tevahîya merovahîye û li serok Apo, Abdullah Ocalan, pîroz dikim.

Ez lêborîna xwe ji hemû dost û hevalan dixwazim, ku ez îro ji ber karê taybet vega diçim welat û li welatim, ji ber ku ez di kongreya FKÊ ya 9emîn de nikarim amade bivîm, ez dubarê lêborîna xwe ji hemû dost û hevalan dixwazîm. Ez hevî dikim, ku ev kongreya FKÊ ya 9emîn we bivê bersîva hemû kemasî û shashiyê derbasbûyî.

Bi Navê Yezdanê dilovan û Tawisî Melek,

Xêmxwar û kedkarên kurd ên hêja,

Bi rastî pishtî vê pêvajoya dawî, ku gelê kurd dest pê kiriye, bi taybetî shoresha Rojava, hilbijatin li Bakûr û Kongreya Netewî, taybetî pêvajoya ji nû ve xwe avakirin ku vêga civaka kurdên Êzîdî çi li Rojava, Bakûr û çi ji li Awrûpa dest pê kiriye, min ne xwest têkevim van niqashên vala. Lê mixabin di vê dema dawî de, her kes qala yekîtî û tifaqê dikin, bi salana vê gotîne wek benishtê devê xwe bikar tînin, lewma bêyî xwesteka xwe, ez xwe mecbûr dibînim, ku beyî ez navê wan tekakesan bidim ez bawerim, ew xwe nasdikin, hin rastiyan bînim zimên.

Di serî de ez dixwazim bêjim ku ji aliyê min ve tu tishtekî min shexsî li hemberî kesî tune ye, pirsgirêk me bîrdozî ye û meshandina xeta rast e.

Ev nêsî 20 sala ye, ku ez wek welatparêzekî kurd xizmeta ol û netewa xwe dikim, ez bawerim gelêk dost û heval min ji nêsva nas dikin, ev cara yêkmîne, ku ez li hemberî capemenî û rêya gistî hîn nêrîn û ditînen xwe tinim zîman.

Ji ber vê yekê ez dixwazim çi weke xebatkarekî vê civakê çi jî weke welatparêzekî kurd bîr û baweriyên xwe di derbarê rewsha civaka kurdên Êzîdî ya dawî de bînim ziman. Helbet, beriya min jî gelek kes û hevalan fikrê xwe anîne ziman.

Bi têkoshîna rizgariyê re, ji bilî saziyên siyasî û çandî, saziyên olî hatin damezrandin. Yek ji van jî Yekîtiya Êzdiyên Kurdistan (YÊK) bû. Ev yekîtî di sala 1993an de ji bo xebatên ol û çanda êzdiyan hat damezrandin. Di demeke gelekî kin de cîhê xwe di nava dilê êzdiyan de girt. Gelek xebatên ku mirov pesnên wan bide kir. Ji ber ku xeta wê, siyaseta wê, hedêf û armanca wê diyar bûn û baweriyêk dabû gel û civakê.

Ev kar û xebat heya astekê hat û ez karim bejim ku heya sala 2004an berdewam kir. Lê pishtî ku Yekîtiya Êzdiyen Kurdistan sîstema xwe guhert û bi navê Federasyona Komelên Êzdiyan xebat hate meshandin dikare were gotin ku rêxistîn ji xêta xwe der-

ket. Ji ber ku hin kesên niyeta wan xirab û ne layîkî vê sazîyê bun xwestin veguhertina çêbûyi û derfetên heyi, li gor berjewendiyên xwe xirab bikar bînin. Niyeta wan kesa nê wîsa be ji, lê di pîratika wan de wisa xwuya dikir.

Her ku diçû vê saziyê xwîn winda kir. Car carnan gotin, em kare olî dikin em nikarin kare olî û siyasî tevlî hêv bikin. Lê her ku dûr ketin, ewqas ji ketin xizmeta dijmin. Ji ber ku dijmin digot, divê hûn xwe dûrî siyasetê bikin.

Gelêk cara ji hevalên meyî ku destê xweyî alîkariyê dirêjî rêxistina gishtî dikirin re digotin, hûn nikarin bi du nasnameya kar bikin. Ev tê çi wateyê? Pratîk jî vê yekê nîshan dide!

Hin Minakê din jî, ji ber ku kesên bi helwest, tevger û hemû danûstandinên xwe rêzik, prensîb û rêbazên rêxistinê nas nêdikirn ketîn nav, kesayetiye xwedî kariyerîzmeke nexweshwarî ye. Naxwazen hesab bidin û xwe wek kesen ku hesab jê wan neyê xwestin. Xwedî karakterekî nerûnishtî û bêserûber. Zeraren mezin dabûn û didin civaka me ketîn nav û bûn xebatkar.

Ji bo ku ev sazî disa bivê sazî were xêta xweyî rast ya 1993, pewîst e Encamê Kongreya FKÊ ya 9Emîn bash were xwendin. Bivê ji nûva xwe avakirin û li gor rihê pêvajoyê xwe amedê bike. Êdî divê em civaka xwe bi gotinên vala nexapînin û pewîst e civak ji sere xwe rake û rast biaxivin. Ev kes di nava partiyên Alman û partiyên li bashûrê Kurdistanê de cîh digirin. Ji bo berjewendiyên xwe, xwe weke berpirsiyarên êzdiyan nîshan didin. Ev kes bi kar û xebatên xwe ji aliyê êzdiyan ve bash tên naskirin û divê hejî werin naskirin. Ji ber ku dema pêwîstiya êzdiyan bi alîkariyê heye, ev kes li meydanê nîn in. Lê belê dema rant hebe, dema berjwendiyên wan tê de hebin, serê xwe bilind dikin.

Xewendevanên hêja,

ji bo ku ev tistê, ku min li jor anî ziman were famkirin z

ez çend pirsên wiha dikim?

Dema ku sazîya we bi navê Yekîtîya Êzdiyên Kurdistan Kar dikir, hin ji Biryar. Rêzigname û Pivanê we evûn:

1.) *Xêta welatparêzî*

2.) *Girêdana bi çanda kurdî*

3.) *Wekhêviya jin û mer*

4.) *Qêdakirina Qelên*

5.) *Dijî halandin û asimlasyonê civakê*

6.) *Vêgera ji bo welat*

7.) *Dij bertîya hesê meyî siyazî bi dismin ra*

8.) *divîya bu ku be berjewendiyên xweyî sheqsî jibo civaka xwe kar bikin*

Vega çî ye? Çend xal wiha dikarin werin rêzkirin:

1.) *Sazi û kesên ku dijberiya rêxistina gishtî dikin, karin bi awayêkî azad û serbest werin bivîn xebatkar. Beyî ku rewsha wan diber cav ra neyê derbas kirin, mixabin.*

2.) *Kesên bi fikrê xwe jî li dijî felsefeya Zerdesht in ev dixwazîn di sheqsê felsefeya zerdeshtiyê da li dijî xêta Rêber Apo derkevîn, xwendevanên hêja, ez nabejîm bila êzdî bêjin em têv zerdestî ne lê gotîneka bav û kala hêya dibe wexta merov got kêw divê ti zanibe nikil zora. Gava mirov kurdên êzdî ji zerdeshtiyê qut bike, mirov wan ji kurdayetiyê jî qut dike.*

3.) *Bi dêhan xebatkarê ku bi salan kar kirina vega dêv ji karên vê saziyê berdana ma ev nê sebeba ku rêxistîn ji xêta xwe dûrketîya ya? Mixabin!*

4.) *Ma dema Yekîtiya Êzdiyên Kurdistan kesên ku qelend bistandina karibûn bivîn xebatkarên vê saziyê? Mixabin kesên ku ez karim nav ji bidim ku qelend 25.50 hazar € stadina bûn andamê vê saziyê? Mixabin!*

5.) *Ma ku em li gor destûr, rêzkima YÊK ê, têv hêvbigerin, ma serokê hin mal û komelên ku vega xwe wek berpîsyare êzdiyan nishandidin karibûn îro qelen qizê xwe bistînin û em ji bicîn tifaqê bi wan ra çêkin? Hêta ku hisab ji wan nêhata xwestin? Mixabin!*

6.) *Ma ku em li gor destûr, rêzkima YÊK ê, têv hêvbigerina, ma kesên ku ji texrîbatê bêhtir tu karên bi kêrhatî naken tevlîhev. Kesên sekter, serhishk, ji xwe razî û xwedî ramanek pashverû karibûn hisab nedin û bivîn endamê vê saziyê?Mixabin!*

7.) *Ma ku em li gor destûr, rêzkima YÊK ê, bimesîna hîn kesan karibûn îro vê rêxistine jibo berjêwendiyê xwe bikar binin û têxin xismeta xweyî seqsî û malbatî? Mixabin!*

8.) *Ma ku ev rêxsitin ji xêta xwe dûr nekta û rota we xwarnebûya her kesî karibûn bi awayêki kefî nesî van nîrxa bivûna? Hin kes bixwazin bin qahreman ,bixwazin bin berxê koza êzîd! Mixabin!*

Xwendevanên hêja,

em dejin pewistî zêda niqashê nake?

Ji ber ku kongreya FKÊ we di 8. hêzîranê de li sala 2014 tê lidarxistîn û nes dibe!

Divê encamê kongreyê bash werin xwendîn, jibo ku shashiyê hatina kirin dubare nebin pêshiya hin çewtî û nexweshînên dema derbasbûyî de û hin kesan bê girtin.

Jibo ku meshandina kar û xebatek durûst ben mesandin. Ez vê agahdarkirinê wek peywîrek mirovî û welatparêzî dibînim û hêvîdarim peyam wê cihê xwe bigrê û pêshiya hin çewtî û nexweshînên dema derbasûyî de bê girtin.

Peshniyar:

1.) *Navê FKÊ were gûhardin bivê Yekitiya Êzdiyên Kurdistan (YÊK)*

2.) *Divê kesên ku ne welatparêz bin, cihê wan di nav saziya FKÊ anku YÊK tuna be.*

3.) *Divê kesên ku qelend bistinin cihê wan dinav saziya FKÊ anku YÊK tûna be*

4.) *Vegara welat cidî were girtîn.*

5.) *Kesên ku bi salana xwe wek Qahreman û berpisyarê civakê nisan didin bicîn xebatên êzdiya li rojava bikin, ji ber ku pewistî pê heya!*

6.) *Rêxistina Êzdiyan li cihê ku civaka Êzdiyan lê heyî were xûrt kirin.*

7.) *Komîsyone jina û ciwana li herema werin xûrtkirin*

8.) *Divê heyta rûhanî li ewropa were xûrtkirin ji bo pirsgirekê civakê di derbarên olî de*

9.) *Divê lêkolin li ser ola êzdiya were kirin*

10.) *Divê projûr û kovar li ser ola êzdiya werein lidarxistin bi zimanê kurdî, tirkî, almani û erebî.*

11.) *Divê pistgirtina cira tv were xûrt kirin cî madî û cî ji manevî ji alyê hemû civaka êzdî ve*

12.) *Divê ola êzdiya bi fermi li Ewrupa were qebul kirin û serlêdan cebivîn*

13.) *Divê bi awayekî xûrt û aktif civaka kurdê êzîdî pistgirtina shoresha Kurdistanê bikin û tevlîbûn pêk were*

14.) *Pewist e kesên ku xwe zana û berpisyarê civakê bi salana dibinin, li heremê, xwe didin jiyan kirin ji van herema derkevîn bicîn cihê ku pewistîya civakê bi wan heyî*

Tibinî:

Dost û hevalên hêja,

ez wek Cercûr Cemîl ji van peshnyarê ku min li jor anîne ziman re amedê me.

Ez hemû kesên ku ez bejim û ew xwe nasdikin dawetî vî kare pîroz dikim. Fermo, werin ser kar!

Divê edî di vê Kongreya FKÊ ya 9Emîn de,

Em ji bo sal bî sal xwezi bî par bejîn edî bêsa!

Bi silav û rêzên shoreshgerî,

Bimînin di nav xêr û xweshiyê de û ji we re serkeftin.

5ê Gulanê li sala 2014

Cercûr Cemîl